

Di himbêza

Darsmaq

Dareka kûvî ye li çiyayên nizm, pesar û nav rezan şîr dibe. Dareka tafîre û heta çar mêtir û nîvan bejnê dîke. Stûratiya qurmê wê beje heşt sentîmêtir in. Jiyê wê ne dirêje û her ji rihan şîr dibe. Tûvil tenik û gewire. Belgên wê lyek siwarin û lêv bi didanok û pûrtoyîne. Kulîlk reng kesk û şîr e. Nîsan û gulane diyar dibin. Fêkî ji her uwşî ye û dûmahîya havîne dibîne dendikên simaqê. Dendikên jêgofî bo nav xwarîne û tîrşkirina wê û bo nav zelatê û dermanan dihêne bi karînan. Simaq ji rihan û bi şitlan û bi tovî zêde dibe.



Didankusk

Jîngeh: Li erdên navînhêlên bi rewa û li ber lêva hindêk deravan tyekirre û qan qan şîr dibe.

Nîşan û salox: Giyayekî salane ye heta mêtîrekê bejnê dîke û rast radibe. Belg davên dirêjên tirtale ne û dirêjayîya wan heta 15 sentîmêtran diçe. Kulîlk spî ne û biçûk û têkirre û di berêkirre ne. Piyek ve serîkekî sihwankî piyek dînin û piştî hişk dibin davên kulîlk bi serîve dihêne yek û dibîne komêka zilkên mil dayîne yek, xelk van zilkan piştî xwarîne û bo didan paqîjkirîne kit kit dikine di ber didanan re.

Pêkhatin: Ji van keresteyên kîmiyayî pêkhatî ye: Fyoranoker, xîlîn, emîdîn û filafînoyîd û ji 12-14 jî sedê ji tovê vî giyayî pîroftine.



Dalerreş



Nav: Dalerreş
Mezinatî û kelîwaş: Ji 98
 □ 105 sentîmêtîran dirêje.
Saloxet: Reşekî ser bi
 qehwayî ve ye. Kurî xirr û sê
 s0 û reşe. Ser û stu bê perin,
 pirz û mûyekî reş bi kulo-
 vanka serî ve ye, rasta
 patkê û st0 û li dor çavan bi
 spî ve ye. Şaperr reş in. Çav
 qehwayiyekî bavsorin. Nikil
 reşe û pêxwelkî ne.
Jingeh: Li zivistanan qesta
 welatê me dike û li çîriya
 yekê dihê û li adarê diçe. Bi
 tenê li çiya û deştên veder
 dijî.
Zêdebûn: Hêlîna xwe li ser
 daran çê dike û ya mê
 hêkeka spî ya bi pinyên sor
 dike.
Xwarin: Goştê kelexên
 mirare.
Cihên lê belav: Li hindek
 deverên jêriya ewropa û
 joriya Efrîka, Asya, Filistînê,
 Tîrkiya, Edin, îran, Efxanistan,
 Tîrkistan, çiyayên Hemelaya
 û Çînê xoche.

Kelê Kûvî - Kûv

Kelîwaş: Temet bizineka
 kehî ye. Senga wî ji 50 -60
 kêlograman e



Nîşan: Mûyê wî kurt û nerm û reng qehwayiyekî bi
 ser reşî ve ye. Binzik spî ye. Kilka wî kurte û rex û
 dorên wê pinyên spî lene. Pê bi hêz û kurtin û wekî
 yên bizinan bi sumin û reng reş û spî ne. Şaxên yê
 nêr dirêj û kivankî û reş û gehigehin û bo piştê ve
 diçemin û dirêjayiya wan heta 78 sentîmêtîran diçe
 (yên bizinan kurttir in). Yên nêr wekî nêriyê bizinê
 kehî bi rihdine. Ji guh û bënëve gelek hişyar e. Heta
 hevde salan jî dijî.

Jingeh: Li Kurdistanê (li nav çiyayan, li şikêrên asê û
 zinarên veder) komkome dijî.. Gelek çespane û
 xweş bi çiya vedîçe.

Zêdebûn: Avziya wî wekî ya pezî pênc mehin û
 heyiva gulanê dikeve ser zanê û zêde dibe.

Ya mê bara pitir
 têjîkekê û hindeca
 dûyan dike. Têjîk reng
 gewirekî vekirî ne û
 heta şax lê nehên
 wekî tekûzan lê
 nahên.

Xwarin: Xwarina wî
 belgên daruberan
 û hindek fêkî û
 giyane û spêdezûyan
 avê jî kanî û rûbarên
 nav çiyayan vedix-
 win.



Va ji bizanibe!

Eger têjîka dolfinî yan ya nehingî demê bûnê jî
 rêve serê wî jî zikê makê derikeve dê di bêhn
 lêkêşana xwe ya yekê da di avê da bixeniqe. Ji
 rêve kuriya wî jî zikê makê derdikeve û mak di
 gava bûnê da bi devê xwe pal dide û bi ser avê
 dêxt da bo cara yekê bêhna xwe hilkêşit û
 naxeniqe.

